

Kurtejiyana mamoste Reşîd Hemo

Hesenê Cumî

Siyasetmedar û xebatkarê navdar, mamostayê hêja Reşîd Hemo (Bavê Qedrî) di sala 1925 an de li gundê Hobka – Raco – herêma Efrînê ji dayik bûye. Di sala 1933 an, li dibistana Reco ta rêza sisiyan xwendî ye. Ji ber rewşa aborî xwendina xwe bi serî nekirî ye. Li gundên Bilbilê zarokan bi xwendin daye. Li bajarê Efrînê bi alîkariya hin havalan dibistanekê vedike û di sala 1951 an bi alîkariya Şewket Henan , Xelîl Mihemed û Îbrahîm Qadir re, komeleya çanda Kurdî dadimezrîne. Armanca wê komelê, belavkirina çand û hînbûna zimanê Kurdî bû, ji ber wê jî tê girtin. Piştî zîndanê, ji nû ve vedigere gund û dest bi hokirina zarokan dike.

Li bajarê Heleb, di sala 1952 an de, bi riya dostê xwe Mihemed Salih Xano- ji Kobaniyê-derbasî nav refê partiya Komonîst dibe. Li Kurdaxê dibe kadirê komonîstan û di helbijartina perlemana sala 1954 an de, ji ber partiya xwe ve tê pêşkêşkirin. Di wê demê de, hukariya hestê netewî ,bi riya Komelên çandeyî- Cezîrê, Şam, Heleb, Kovarên Hawar û Ronahî û pitûkên li ser Kurdan di nav Kurdên Komonîst de, bilind dibû. Ji ber wê jî, berpirsiyarên Komonîst bi tirs bûn. Lewre, Reşîd Hemo rêdikin Munbic , Bab , Selqîn , Mi'erê , Harim û Idlibê .

Di sala 1955 an de, nakokî di navbera partiya komonîst û hevalên Kurd , bi rêbertiya Reşîd Hemo derket hole. Sedema wê jî pirsê Kurdî bû. Di wê salê de, raporekê ji komîta navendî re rêdike û weha dinivîse "*gereke belevok û weşanên partiyê li herêmên kurdî, - Kurdax , Kobanî û Cizzîrê- bi zimanê kurdî bin, ji ber ku milletê me bi zimanê xwe çêtir têdighê*" û pişt re dev ji partiya Komonîst

berdide. Lê, dev ji kar û xebata ji ber milletê xwe ve bernade.

Têklî hevdiştinên xwe bi Apê Osman Sebrî re berdewam dike û ji encama wan têkliyan , di 14ê Hizêrana 1957 an de, bi beşdariya" Apo, Reşîd Hemo, Şewket Henan, Xelîl Ebdela, Mihemed Elî Xoce, Hemîd Hec Derwêş û Hemze Niwêran" Yekemîn partiya Kurd li Sûriyê dadmezrîn.

Xebata xwe ya siyasî di nav partiya xwe de, ta salal 1993 an berdewam dik. Û ji wê demê ve , li gundê Hopka dimîne û xwendin û nivîsandina xwe berdewam dikr.

Dr. Efrasiyab Helîmî koça dawiyê kir

Nivîskar û lêkolînerê Kurd Dr. Efrasiyab Helîmî, bi temenê 54 salî - ji Kurdistana Îranê- di 16ê -12—2010an de, li Rûsiya xwetir xwest û ji nav heval û hogirên xwe barkir.

Efrasiyab Helîmî, di sala 1980î de, cî di nav refê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de digre. Piştî demekê, ji bo xwendinê, diçe Yekitiya Soviyet. Li wir xebata xwe ya zanistî dixwe rajaya gelê xwe. Ji berhemên Dr. Efrasiyab Helîmî " Kurd di erşîva Rûsiya û Sovyatê de" û " Rojhilata Kurdsitanê di serdemê şerê cîhanê yê duwem de" belav dike. Pîraniya wan belge û dukomêntan peywendî bi Komara kurdistanê û Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê ve ye.

Bi navê komîta weşana Newrozê, bila serê xwedî, haval û hogirên wî sax bin.

Pîroz be

Bi hatina cejna birayên File û cejna sersala ji dayîkbûna Pêximber Îsa , em bi navê komîta Newrozê hêviya sal û jiyaneke bê kul û derd ji wan re dixwazin.